

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEW ROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar (151) Sal 27 02ê Rêbendan 2022 z - 2633 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (100)L.S

# Saleke nû... Li ser kavilên Sûriyê, hê jî Kund dixwîne!



دمار مبنى السراي الحكومي القديم في حلب الذي شُيّد عام ١٩٢٨م

## Desteya sernivîser

Piraniya gelên cîhanê bi şahî, dilgeşî û hêviyên ciwan sala nû, sala 2022an pêşwazî dikin. Lê mixabin ku gelê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe ve, bi derd, xem û kulên giran vê salê jî mîna salên borî pêşwazî dikin!

Di vî şerê wêran û talanker de ku Sûriyê taromar kiriye, bêtir ji 500 hezar mirovî jiyana xwe ji dest dane, 5.6 milyon mirov reviyane, penaberî Turkiyê, Libnan û Urdinê bûne, 6.7 milyon mirov di bin çadir û konikên rizî de dijîn û bêtir ji 7 milyonan jî, gund û bajarên xwe yên resen li şûn hiştine, li deverên ku hin aramî peyda dibe cîwar bûne, li hêviya wê rojê ne ku ew vegerin ser xaka bav û bapîran.

Herwiha, .....

2

# Kesayetiya welatparêzî navdar Ûsivê Gulo û du neviyên xwe ve hatin armanckirin!

Roja 9ê Çiriya Paşîn, bi balefireke bê ajovan, li Qamişlo/Taxa Hilêliyê, Kalê 80 salî Ûsivê Gulo û du neviyên xwe bixinizî hatin kuştin. Ev tewana hovane diyar dike ku dewleta Turkiyê naxwaze aştî û aramî li devera Bakur û Rojhilatê Sûriyê rune û bi hemû şêweyan dixwaze Ezmûna Rêveberiya Xweser têkbikîne.

Bi vê boneya xemgîn, birêz Mihyedîn Şêx Alî, birûska sersaxiyê ya li jêr, ji malbata Gulo û gelê Kurd re weşand:

**Sersaxî**

Kuştina apê Ûsivê Gulo yê 80 salî û herdu neviyên wî roja 9ê Çiriya Paşîn li Bajarê Qamişlo-Taxa Hilêliyê, di çarçewa siyasetên dijminane yên dewleta Turkiyê dijî hundirê Sûriyê bi gelemperî û gelê Kurd bi taybetî cih digre,



û eve ne cara pêşîn e ku bi balefirên bêajovan(Drûn) û bi armanca çavşikandina gelê me û belavkirina tirs û tevliheviyê têkbirina aştiya navxweyî di .....

2

# Roja Dara Zeytûnê ...Û Bajarê Efrînê

**Nazdar Hesen**

Dara Zeytûnê li ba pir gelan dareke nirxdar û pîroz e. Ew di wijdanê(nîhada) mirovan de, çi jin çi mêr cihekî mezin digire û ji mêj ve wekî sembola gerdûnî ya aştiyê tê dîtin. Nirx û giringiya wê ji gelek sedeman hatiye, sûdeyên wê yên tenduristî û sûdeyên ku di asta civakî, çandî, aborî û jîngehê de dide mirovahiyê.

Ji ber van sedeman Konferansa Giştî ya UNESCO›yê di rûniştina xwe ya çilemîn a sala 2019an de her sal 26ê Mijdarê wek Roja Dara Zeytûnê ragihand û armanca wê ji bo pirkirin, mezinkirin, parastin û danasîna nirxên dara zeytûnê ye.

Di dema ku Cîhan ji bo çareserkirin û guheztina avhewayê şer dike û pêdivî û giringî pirtir bi çandinî û xwedîkirina darên zeytûnê dike, li aliyekî din şer û ceng bi vê dara pîroz re didome. Belê li ser asta Sûriyê û li bajarê Efrînê, bajarê ku herî bi nav û deng bi piraniya hejmarên darên zeytûnê û bi zêt û zêtûnên xwe navdar e, ji sala 2018an de û ta niha; ango piştî dagirkirina wê bi sedhezaran ji darên wê hatine qutkirin û şewitandin û bi sedhezaran ji xwediyên wê desteser bûne û di destê çeteyan de mane. Ne xizmet, ne cot û ne jî avdan û ew wek xwediyên xwe yên Efrînî li ber çavên rêxistinên navnetewî û mafên mirovan dîl û bêxwedî mane, û her roj ew toşî zilm û zorê dibin.

Bi boneya Roja Dara Zeytûnê pirs tê kirin.

- Ka me tu çalakî bi boneya vê rojê kirine?

- Ta kîjan astê konferansên wiha yê karibin xizmet kin û rêbend bin li pêş qutkirinên darên mayî?

Wek bapîrên me digotin: Dar jî ewladên me ne, xizmet û parastina wan ne ji yê zarokên me kêmtir in.

---

**Kesayetiya... Dûmahîk**

civakê de, ew çalakvanên Kurd armanc dike.

Di wê dema ku em vê tewana hovane ya dewleta Turkiyê rûreş û şermezar dikin, li ser navê hemû heval, hogir, dost û rêxistinên Partiya Yekîtî ya Demokrat Li Sûriyê, em sersaxiyê ji we û hemû hezkerên hersê pakrewanan Usiv Gulo, Mihemed Gulo û Mezlûm Gulo li hundir û derveyî welêt re dixwazin, bila hun û gelê me xweş bin!

Erbîl: 10ê Çiriya Paşîn 2021Z

**Mihyedîn Şêx alî**
**Sekreterê Yekîtî ya Demokrat Li Sûriyê**

---

**Saleke nû... Dûmahîk**

di encama vî şerî de, di siha lawaziya rêxistina navnetewî(UN), û tabloya têkilyên dewletan, û bazarên siyasî de, dewleta Turkiyê û çekdarên rikberiya Sûrî yên bi fermana wê tevdigerin, parçekî mezin ji bakurê Sûriyê dagir kirne ji nav wan Efrîn, Girê Spî û Serê kaniyê ne, ku li wan deveran, bi plan Siyaseta tunekirina Kurdan û rakirina wan ji xaka bav û kalan birêve diçe, bê dudilî mirov dikare bêje ku siyaseta Jînosaydê dijî gelê Kurd li dar e, metirsî li ser mana wî heye. Di vî warî de, gelek belgeyên belavkirî yên rêxistinên mafên mirov vê rastiyê tekez dikin.

Ji ber berjewendiyên abûrî û nakokiyên di navbera hêzên mezin ên cîhanê de, pirbûna aliyên peywendîdar ên herêmî û navdewletî, serhişkiya rijêma Sûrî û tunebûna rikberiyeke pêbawer, civaka navnetewî, ta roja îro, ji bo dîtina çareseriyeke aştiyane ji vê qeyranê re negihiştiye hilwesteke hevbeş û ti asoyên lihevkirin û çareseriyê xuya nakin. Di vî warî de, qaşo ji bo çareseriya vê pirsa ku mîna Kurd dibêjin bi girêka kor hatiye girêdan, 17 rûniştinên Astana lidar ketine ku ya dawî li roja 21.12.2021 bû, û 6 civînên Komîta danîna makzagonê(Destûr) li Cinêvê lidar ketine ku ya dawî li roja 22.10.2021ê bû, yek gav jî bal çareseriyê ve nehatiye avêtin!

Di warê Kurdî de jî, dîsa mixabin ku rewş pir bi derd û êş e, hê jî tevgera me bi berpirsiyarî rewşê naxwîne û tiştên ku lezgîn têne xwestin, nake û piştguh dike. Hê jî, tevî ku lîstike, dek û dolab û planên neyarên doza gelê me aşkere ne, çawa ku bi hemû hêza xwe ew agirê kîn û berberiyê di nav hêzên Kurdî de gur dikin, bi zimanekî dirêj, bê şerm û fedî dibêjin em nahêlin ku Kurd li hev bikin û bibin xwedî yek hilwest! Tevî wê, hê jî tevgera me partiyetî û kesayetiyê di ser Kurdayetî û berjewendiya gel re digre!

Pêwiste ku tevgera me li xwe vegere, nerîn, hilwest û cîgehên xwe binirxîne, dest bi guftûgoyeke biratî îjdil di navbera hêzên xwe de bike, û li ser xêzên stûr ku berjewendiya gel diparêzin dest bide hev, li hember planên tunekirina gelê me rêzên xwe bide ser hev û xebatê bike.

Li dawiyê, Em bi hêvî ne ku sla nû aştiyê ji gelê Sûriyê û hemû gelên cîhanê re bîne, aramî, azadî û wekheviyê ji gelê me yê Kurd re jî bîne.

***Sala 2022 an li we û hemû gelên cîhanê pîroz be!***

# Rewş li pêş e!

**Zanistê cûmê**

Erê, wek tê naskirin bi gelemperî Kurd mêrxwaz, qehreman, leheng, sax û comerd in û di firkên teng de kanin ji bin barê bi ser wan de hatî rabin û berevaniya ji ber xwe ve bikin. Lê mixwabin û sed carî, çavê felekê birjin, ku Kurdên rojava û bi teybet Kurdên Efrîna rengîn ketine vê rewşa dijwar û ne lihevkirî.

Piştî dagîrkirina Çiyayê Kurmênc bi destê çeteyên terorîst û bi rêbertiya Turkiyê, nema tu kes kane berevaniyê ji ber xwe ve bike, ji ber ku tu mal yan mirov bi çek nehîştin û her gundek bi awakî tê êşandin û êşcengekirin. Her giropek ji çeteyan berpirsiyarê çend gundan e û her giropek ji wan zagon, vêrge, kirînfirotin, çûnûhatin, danstandin, girtinberdan û ta dezgeh û fabrîke bilî yên dinin. Yanê mirov kane bêje her yek ji wan giropan welatekî biçûk e, di hundir bajarekî de karê xwe dike, haya Turkan ji wan heye û di bin kuntrola wan de dixebitin.

Dixwazim çend nimûnan ji xwendevanên rojnama Newrozê re û ji raya giştî re xuya bikim, ku çawa vêrge û bi çi şêweyî bi Kurdan re danstandin dibe.

Gundê Tilfê, Keverzît, Til hemo, Kanîgewrikê û gundên derdora wan, di bin kontrola milîsên El-hemzat bi serokatiya Ebû Cabêr de ne.

1) - Firna nên li gundê Firîriyê ya dest danîne ser û çênabe kesekî din li wan gundan nên belavke.

2) -Mekbeza zeytûnan li gundê Keferzîtê ya dest danîne ser û çênabe tu kesî din çiwalên zeytûnan bibe tu mekbez din.

3) - Di demek nêzîk de fabrîka tenekên zêtê çêdikin.

4) - Xwedî du kerî pez î gewr di nav darên zeytûn, henar û sêvan de diçêrîne û xwedî dike.

5) -Her sal serî darekê du dolaran wek vêrg e dibe.




6) - Di her gundekî de bêtirî 500 pez yê çeteyan û xwediyê wan hene di nav zeytûnan de diçêrînin, darên zeytûnê bûne (bangî).

7) - Li her gundekî bi sedan darên zeytûnê tên rêşkirin û dizîn, bilî diziyên biçûk çi bi tûran çi jî bi satilan.

8)- Kesên ne li Efrînê nîvî zêtê dibin bilî mesrefê (bira, wekalê) û yên gûman kirine ku tev rêveberiya xweser ve kar dikirin, dora (10000) darên zeytûnê bilî cureyên din serber birin e.

9) - Bi dehan kes hatine girtin û hêj berdewam e, li seranserî çiyayê kurmêc zor û stema wan li her gundekî bi şêwe û awakî cudatirî yên din in.

Mixwabin hin kes ji me hene dixwazin gula têkin diriyê, ma gelo gul dikevin diryê? Bê fedî û bi serbilindî dibêjin rewş li pêş û baş e, û ew kesên Efrîn firotin e û keç û xort bi me nehîştin e ji van xeraptir bûn! Baş dizanim ew kesê wiha dibêje: Bi sedan darên zeytûnên wî hatine dizîn, bi xwe yan mervên wî bi mehan an bi salan hatine girtin, pezî wan gul û çîçekên hewşên wan tarmara kirine, û hîn dibêjin rewş li pêş e!

Efrîn bi meriv û hemû zeviyên xwe, di bin zilim û zorek rojane de dijîn. Rewş li şûn e ne li pêş e wek tê belavkirin. bi gerekî lihevkirin û yekrêziya tevgera kurdî ye.

# ROJÊN REŞ Û BI›ÊŞ JI BÎR NABIN

**Mislim Şêx Hesen**

Li berbanga roja panzdehê heyva Rezberê 2014 an Z, ji nişka ve û ji hemû aliyên gundewarên bajarê Kobanî ve, rêxistina terorîst a DA›IŞ›Ê bi awakî hov û bê ferq û cudahî, bi top û tangan êrîşî gundên derdora Bajarê Kobaniyê kir, û niştecihên wê yên jar û reben, ax, kelûpel û lawir li şûn xwe hiştin, û ji hersê aliyan ve wek lehiyan li ser rêç û riyên ku diçin Bajarê Kobaniyê herikîn, bê ku zanibin çarenûsa rêwîtiya wan bi kû ve diçe. Û her ku ew pîçekî ji dengê topan û eniyên şer dûrdiketin, karwanên tirombêlan li rex riyan radiwestiyan, da ku zarok, nexweş û kesên temenmezin bihna xwe vedin. Vêca cihên rawestandina karwanan li rex riyan wek bajerokan diyar dikirin, çimkî bi hezaran mirov, torombêl û





lawir ligel hev radiwestiyan û dengê girî û hawara pîr û kalan û barebara pez ji nav wan koman dihat bihîstin.

Lê, tevî rewşa dijwar, dîsa jî hizir û ramanên xelkê li cem mal û warên ku li şûn xwe .....

4

# Hilbijartin bi dawî bû, çi ji me re heye ?

**Ibrehîm Şitlo**



Belê, Hibijartin li Elmanya bi dawî bû, ka me çi jê ye ?

Encamên hilbijartina Parlamentoya Federal li Almanya diyar bûn. û çi ji mere heye?

Weke min di Banga xwe de beriya Hilbijartinê sê caran gotibû ku divê em hêjabûna dengê xwe ji bîra nekin û her yek ji me rojê dengdanê biçe ser sandoqê û denge xwe bide partî û kesên aşîtîxwaz, piştgêriya mafê mirovan dikin û NE tenê şopa berjewendiyên aborî û stratîcîk bikin.

Dil şaye, tevî ku serkeftina Partiyên Aşîtîxwaz ne weke dil dixwest hat, lê ev gaveke baş e û ez hêvîdar im ku Partiya KESKAN (die Grünen) li bîr û baweriya xwe xwedî bimîne û bêje:

Ji îro pêde polîtîka hukumeta Elman ya derve wê ne serberdayî be, wê kontrolek li ser hebe, ew jî wê bihêle ku kolîdarên milletê Kurd û yên hemû cihanê jî ne weke ta îro bê hevsar bimînin!

Tevî ku hêza Lobî yê neyarên Kurdan di nav Partiya Sosyelîstê Demoqrat (SPD) de xurt e, lê çiqas be, wê polîtîka hukumetek Elman nuh bi rêberiya keskan û sosiyel demqrat wê ne weke hukumeta xanim Mêrkil di warê polîtîka derve de serberdayî be.

Lê, divê em bizanibin ku hukumeta Almanya ya nuh were di destê kê de be, wê xebata bicihanîna berjewendiyên welatê xwe li gora programa xwe û li gora dem û mercên navdewletî cih bi cih bînin.

Divê xew nekeve çavên Kurdan û li bende nemînin ku partiyek Elman weke Partiyê Keskan (die Grünen) jî wilo ji ber Kurdan ve dijminatiya kolîdaran bike.

Pir, hindik wê li gora demê goftûgo li ser mafê Kurdan û parastina ziman û kultûra milletê Kurd bikin, li ser girtiyan di zindanên Tirkiyê û Îranê de biaxêvin, lê îro li cihanê diyare ku her tiştek bûye bazarê dayîn û sitandina berjewendiyan û ramanên mirovatî, demoqratî û mafê milletan car carna ji wan berjewendiyan re dibin gorî û qurban.

Divê rewşenbîr, xwendevan, polîtîkvan, rojnamevan û hunermend her li pirsgirêka xwe bibin xwedî û bi hiş, guh û çavên xwe hilsa bin.

Divê em li gora demê bin, her gav şiyar bin, lobî pêkbînin, bêjin û bi zimanê Almanî kar û xebata xwe bikin ku pirsgirêka xwe herdem bi bîra wan bînin, bi wan bidin zanîn û baweriya wan bi mafên milletê Kurd bînin.

Dost ji me re pêwîst in, dijminên me gelek in.

Şiyarbûna netewî li penaberiyê çeka parastina kesayetîya me ye, namûsa me ye, Jiyaneke bê rûmet bê nasname, ne jiyan e!

Dema em bûn Kurd û me kesayetiya xwe weke Kurd parast, bi Almanan da nasîn ewê jî nasnama me bi qedr û girabuha bigrin.

Dema em zarokên xwe rêkin dersên bi Kurdî, dema em xwedî li dîrok, kultûr û kesayetiya xwe derkevin, wê demê, civata Alman wê bi rêz û bi çavbilindî li pirsgirêka me temaşeke.

Eger em destên xwe bidin hev û li mafên xwe xwedî derkevin, berpirsiyarên Alman jî wê piştgêriya me bikin.

Îca, çareserkirina pirsgirêka me ji me de destpê dike, divê em weke yek hêz bin, da karbidestên Alman jî me weke hêzekî beşdar bibînin.

Para me di mercên hilbijartina Parlemanê Almanê Feferal wê hebe eger em li Almanya weke civatek Kurd yek dest, bi yek deng, yek raman nêzîkî hev bin û xwe wilo jî bidin nîşan.

Li dawî gotinek xweş buhara dile:

Ez Kesên Kurd ku di hilbijartinê de serkeftine pîroz dikim û dibêjim wan:

Her bi sebilindî û pêşketin bijîn!

27.09.2021

**Rojên reş... Dûmahîk**

hiştine bûn. Lewra jî, hin kes gava ku derfet peyda dibû; Bi dilên şewitî diçûn cihên bilind û berz, da ku li mal û warên ku li şûn xwe hiştî binêrin, û dîsa bi dilên şikestî û çavên tijî hêsir neçar bibûn ku rêwîtiya xwe berve bajarê Kobaniyê di bin dengên tang û topên rêxistana terorist a Da›işê de berdewam bikin, û weha bîtirî /300/ gundî li şûn xwe vala bihêlin.

Lê, gava karwanên xelkên gundewarê Kobaniyê gihan dergehên bajarê Kobaniyê û dîtin ku niştecihên bajêr jî xwe amade dikin ku berve Sînorê Dewleta Tirkiyê biçin; Ew bi xemgînî û bêhêvîtiyek mezin hest bûn, çimkî wan bajarê Kobaniyê wek rawestgeheke dawîn ji xwe re pêşbîn dikirin. Lewra jî, ew yekser û bêrawestandin di nav mayînan re berê xwe dan sînorê Tirkiyê. Lê destpêkê, Asayêş û leşkerên Turkiyê rê nedan xelkê ku derbasî Kurdistana serxetê bibin, lewre li rex têlên Sînor komkomî bûn, û ji dûr ve weke bajerokan xuya dikirin. Lê, piştî çend rojan xelk bi şêwakî bêrûmet derbasî aliyê din kirin. Û ji ber wê jî, mirov dikare bibêje ku ew kêlîk, kat û rojên herî dijwar di jiyana xelkê Kobaniyê de bûn.

Çimkî bi ser tiştê me gotiye de, gava ku wan herdu hesinên Tirênê û Sînor derbas dikirin; Bi sedan mayîn jî bi wan de teqiyan, di encamê de bidehan kesan jiyana xwe ji destda, û gelek kesên din jî dest û lingên xwe wenda kirin. Bi vê felaketê, Xelkê Kobaniyê bajar û 300 gund li şûn xwe hiştin, û li hemû bajar û bajarokên Tirkiyê bûn penaber. Ji ber wan serpêhatiyan, ew rojên reş û dijwar li cem xelkê Kobaniyê bûn dîrok, û nayêne jibîrkirin.

# Peykerê Bîrdozê

Mihemed Qere Hesen



Dest dabûn bin çengan û bi ser xwe de diramî, nedilivî û ne dişivî, ta çav nedikutan, ji te ye ku kevirekî bi tîpa merovekî di cih de rûniştiye. Ger dest li bin çengan bifilitiya xuya dibû ku canlî ye. Ji nişka ve, birûska ramanekê li mejiyê wî dixist û ew vediciniqî wek yek ji xewa kûr şiyar bibe û bi xwe re digot: Min dît, ya ez lêdigirem min dît, nabe çiqas ji min ve nîzîke, di serê min de dijî û haya min jê tune ye! Ji wê şûn ve diçû li kevirekî mirarî digerî, ku peykerekî wek dilê wî dixweze jê çêbike.

Ew latê divêt didît û danî li nava hewşê datîna. Roja din li serê sibê açetên xwe radikirin diçû li ber lat radiwestî, pê diramî ku ji ku de destpê bike, ji serî de lê (yan) ji ber lingan ve? Piştî mawekê di dilê xwe de digot: Gerek ez ji serî destpê bkim, ji ber ku serî ew ê merov dajoye û endamên din ên gowed bi ya wî dikin. Sêpiya xwe datîna ber lat û destpê dikir, berî ku porê wê bi çakûç, kesk û zimîl şebike, bi xwe re digot: Ma ez porê wê kin bikim lê dirêj bikim? Porê kurtik ji rewşa mêyîtiyê bi dûr dixe, lê ji dîmê heyva şîvxwerî ve nêzîk dike. Na na ezê porê dirêj ên ji tîjikên royê weke solavek zîvî bi ser de berdim.

Bi hilatina royê re wî perên royê bi ser de holdikir. Piştî wê, dest bi çêkirina enî û pozê dikir, wî ew poz ji xizêmên altûnî re çêdikir û berjor hildida, ta ku li ezmên keve û pê qayil nebe. Dihat li ber çavan radiwestî ku mîna tenên tiriyê xoriz çê bike ku şev tê de xewkin, lê ji dilopên gola hêşîn çêke ku bibin deryayên bê binî, lê ji zebercedê çêke, li dawiyê hemiyan tev hev dike jê çavan çêdike. Di pê re, dadiket lêvan çêbike, wî berê xwestibû ku lêvên wê ji ziraviya pelên gulan çê bike û ken herdem jê bifire, ger kê lê mêzebikira vê re bikeniya.

Li dawiyê dîmekî vekirî weke berberoya nû vebûye çêkir. Li wir daket ustiyê yên qazan an wek yên xifşan çêbike, lê herdu li ba dilê wî rind bûn, wî herdu rewş li hev stiran û pê ew ustiyê nû çêkir. Ji wir daket sîng, ji xwe pirs kir: Ez memikan wek hurme, sêv, henar, şemam an zebeşan çêbikim? Ew li ser ramana ku ji werzên her wan êmişxanekê tê de çêkir. Û memolînên wan kirin serê kaniya jînê.

Di pê re daket navê, wî nava wê ji ziraviya pilingan çêkir. Piştî cefakî pir di çêkirina wê de didît, xûya di ber de dayî ye ji gelîkî zivistanê pirtir herikandibû, ger bîstan li ber çandibana û pê avdabana wê têrê bikira.



Wî pîştî vehesîn bir û hat li ber rawestî û bejna xwe li ya wê girt, ku bi qaserê ya wê ye, bal û zêna xwe kûr dayê. Wî bi xwe re digot: Ne min peyker çêkiriye, lê min Înana çêkiriye, û li pêş çavan pir xweşik û rind xuya dibû, û dil li ber zîbaya wê pir lêdixist û xwîn di tamaran de hilnedihat, bê ku lê hay bibe, dibû dilketiyê wê û hiş vê re difirî!

Bi şev û rojan xew ji çavan direvî, tebat û hêmanî di canê wî de nema bû, canê weke hiriyê tev cên hatibû ristin, her yek bibû xaya canê yê din tev hev pişifî bûn û di mêyîtiya wê de hatibû meyandin. Ew demek dirêj sergêjî ma bû, li derman û şivêlan digerî ku pêde here.

Di wê sergêjiyê de carek din birûsk li serê wî dixe, vê re ramana şokirina wê hiltê, tavilê pêla wî datê û serê wî ji êş û janê vedehese, û dest bi rêwresmên zemewendê dike. Bi destê xwe kincên bûkê ji hemî rengan didûre, û bi destên xwe hemî rengên gul û çîçeka kom dike ku pê rûyê wê bi xeml û xêz bike. Gava ew dida ber aynê vê re digot wê: de here tu ne zelalî, dikir weke Tawisê şewq dida û çav lê hiledihatin û bi rojê re digot vemire, ezê li şûna te hilêm!

Wî roja zemewenda xwe nîşan dikir, û hemû dost û hevalên xwe vedixwend. Çiqas amorên kevn û nûjen hene tanî, û li herderê şahiya xwe li dardixist. Gava ew dikete serê govendê li ber awaz, stran û dirûşmên xwe sema dikir, ew û bûkê bi hev re diketin dîlanê û dil bi qaserî çiyakî mezin dibû.

Lê mixabin xû di bejna wî re dibû lêmişt û bûka wî çilpka xûyê jê nedihatin. Wî gewriya xwe bi stranan didirand, lê bûk lal mabû. Wî dikir nedikir ku çawa wê şa bike û germa cên pêde berde nizanî! Bi rojan re wê tu zarok ji wî re ne tanîn, ew jin stewir bû, jiyan sar dibû, ew bi kulfeta xwe re hişk dibû kevir. Û lêmişta demê bi ser de dihat û bûk tê de pişifî û herikî çû. Bîrdoz merov dike kevir û mervaniyê jê distîne.

03.01.021 an

# Rûreşî

**Osman Îso**



Ewrên tarî, çeteyên bênamûs ên mîna roviyan, xwe li ber pepilên mirîşkên me datînan û hişên xwe dixistin nav zelq û rêxê û bi şêweyekî şoreşgerî wan mirîşk û pez didizîn.

Keç û xortên qehreman berevaniya axa Efrînê dikirin û mirin bi stran û lîlîyan pêşwazî dikirin, û her şervanek ji bo axa pîroz şehîd diket, morala wan bilind dibû û kela dijminê xwînmij nizim dibû. Berxwedaniyek nenormal dikirin, da ku taxim û sînorên bajarê xwe biparêzin. Xwîna pîroz mîna kaniyan ji bo Efrînê herikî. Balafirên şemûz, tang, mûşekên kûr, serma, seqem û dilopên baranê nebûn pirsgirêk li pişiya şervanan, yên ku ew û çiyan ji hev re bûbûn pişt û bê hev ew nedibûn tutişt.

Lê lîskeke veşartî çê bû û gundên payabilind mîna kevirên Domîno li pey hev ketin û wêran bûn, û nişteciyên Efrîna rengîn bûn koçber û penaber û ji mal û darên zêtûnê bi dûr ketin. Ew ne dûr in lê ne nêzîk in jî. Li Efrînê mêze dikin û giriyê daran dibihîsin, lê nikanin bi desmala aramiyê dilopên girî ji ser rûyên xwe bişon.

Ew bûn dîlê çadiran. Çadir bi xwe derdekî giran e, mirovê bi çanda avahiyê mezin bûye û ji memikên kelan şîrê lehengiyê mêtiye, di çadiran de mîna bazekî di xefikan de dibe.

Berxwadan jî wisa mîna teyrê baz bibû her roj dîmenên Efrînê, di pêş çavên wî re dibezîn û ken, girî, axaftin û çîrokên hevalên wî di sengerên şer de li şevên wî dibûn mîvan, lê tiştê herî balkêş ew e, berxwadan dibêje:

Çend roj in ez ji rûreşiyê newêrim xew bikim, her ez çavên xwe dadimrînim, giyanekî pak û pîroz seredana min dike, ez nizanim çi ji min dixwaze? Ez mirovekî perîşan im, ne xwedî biryar im. Xwedê!! Ma ev pakrewan çima li xewnên min bûye rik, û li aramiya min siwar dibe?! Ez westiyam û berî ez rakevim, min şûşek mey bi ser xwe de kir ji bo serbest û bê fedî bersiva xwe bidim, de were û çi dipirse bipirs, ez bê gûman ketim xew an ez hîn hêşyarim nizanim, hûş pûş yar im.

Merheba bira! Ev cara siyemîn e û ya dawiyê ye ez seredana te dikim, ji min re bêje Kurd bûne yeknêrîn?

Min got: Na ...Naaaa na na na, qurban te bim, bes ji min bigere, bila ez bi kêf xew kim, here ji berpirsyaran bipirse, tu çima li min bûyî rik law?! Lê tu ji segên har li pêş deriyên wan newêrî?! Ez jî wek te dêşim dinalim, tim bi êş im.

Pakrewan: Min got hûn bûne yek te got na, min got hûn bûne yekhelwest dîsa te got na.

Îro ji te dipirsim, hûn bûne yeknêrîn, tu bêşerm û fedî dibêjî: Na. Ma ji bo çi me xwîna xwe da?

Ma em çûbana di hembêza Ewrpiyekê de yan di deryayekê de fetsîbana, ne baştir bû, hey ke…. ji ke….hey bê na…

La tûûûû li te were.

Ez kelegirî bûm û ji xewa giran hişyar bûm, min rûyên xwe pelandin, min dît ew şil in, vêca ez nizanim ji girî yan ji tufa şehîdan bû.

12. 03. 2017 an

## Pîrozbahî

**Heval û hogirên Yekîtî Niştîmanî Kurdistan…**

**Endamên Ofîsa Pêwendiyan…**

Bi boneya hatina sala nû 2022-an, silavên gerim ji we re hene , em jî bi dil û can Sersala We Pîroz dikin , bi hêviya ku, Sala Nû bona Gelê Kurd û hemî pêkhateyên Îraq û Sûriya , bibe sala geşkirina xebat û têkoşîna hevpar, bona pêkanîna Aştî , Azadî û Wekheviyê.

*Qamuşlî*
*31.12.2021-an*

**Birayê we yê dilsoz**
**Muhyedîn Şêx Aalî**
**Sekreterê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd Li Sûriya**



یەکێتیی نیشتمانیی کوردستان
مەکتەبی پەیوەندییەکان
بۆردی پەیوەندییە کوردستانییەکان



بەڕێز/ حزبی وەحدەی کوردی سوریا

بە بۆنەی سەری ساڵی نوێی زاینی، پیرۆزبایی لە سکرتێر و مەکتەبی سیاسی و سەرکردایەتی و سەرجەم ئەندام ولایەنگرانی (حزبی وەحدەی کوردی سوریا) دەکەم.

ئومێد دەخوازین ساڵی نوێی ببێتە بنەمای یەکرێزی لە پێناو بەدیهێنانی مافی گەلی کوردمان لە رۆژئاوای کوردستان بە ڕێگە چارەی سیاسی و هاتنە ئارای قۆناغێکی نوێی بۆ بەدیهێنانی سورياییەکی دیموکرات لەسەر بنەمای ئاشتی و مافی مرۆڤ و پێکەوەژیانی سەرجەم پێکهاتەکانی گەلی سوریا، یەکرێزی ناو ماڵی کورد و خەباتی هاوبەشیش پێویستی سەرکی ئەو قۆناغەی مێژووییە.

لەم بۆنەیەدا جارێکی تر جەخت دەکەینەوە لەسەر پتەوکردنی زیاتری پەیوەندییەکانمان.

بۆردی پەیوەندییە کوردستانییەکان

# Çawa Sultan Ebdulhemîd Midhet Paşa da kuştin!


**Newafê Bişar**

*Midhet Paşa, Sedir Ezemê (Serok wezîr) dewleta Osmanî bû. Piştî rûniştina Sultan Muradê Pêncan li ser textê Paşatiyê bi demeke Kurt, nexweşiyeke derûnî pêre çêbû. Ji ber ku Sultan Murad mirovekî qenc bû, dilê wî bi milet ve bû, camêrên qenc anînbûn dora xwe û ji xwe re kiribûn şêwirmend. Midhet Paşa, xwedî li Sultan Murad derket û bi tenduristiya wî mijûl dibû, nehişt deng bi nexweşiya wî bikeve.*

*Piştî Murad, dora Seltenetê ya Ebdilhemîd bû, ew li benda saxlemiya birayê xwe nema, bi zorê hat û li ser text rûnişt, û çiku Midhet Paşa jê hêvî kirk u hinekî bêhna xwe fireh bike, birayê wî dê rihet bibe û nexweşiya xwe derbas bike, lê wî xwesteka Midhet red kir û çavreşî avêtiyê, wî ji welêt nefî kir, û paşê, li Tayifê da xeniqandin!*

*Da gelê Kurd ji nêzîk ve rastiya Sultan Ebdulhemîd nas bikin, Mîr Ebdurehman Bedirxan di 4 hejmarên li pey hev (2225-24-23-) ên Rojnameya xwe «Kurdistan» de, ronî avêtiye ser vê tewana xwînî û ji xelkê re zelal kiriye.*

*Ji ber giringiya vê belgeya dîrokî, û da xwendevanên zimanê Kurdî vê bûyerê bixwînin, min ew dosya ji tîpên Erebî guhestiye ser tîpên Krdî Latînî.*



***Di pêşgotina hejmara 22an ya «Kurdistanê» de ku Roja Pêncşemê 1ê Şewal sene1317Koçî, beramberî 2ê Sibata 1900Zayî hatibû weşandin, mîr Ebdurehman wiha nivîsandiye:***

***Istitrad (استطراد)***

Ewe çend hîveke, lawê şehîd Midhet Paşa «E›lî Heyder Beg» ku Izmîrê nefî bî, nedikarî ji wê derê biçe tu dera, ji zulm û istibdada Padşah bê zar bî, ew bi quweta dewletên dî xwe ji welatê Xinkar xilas kir, ew jî revî, hat li Misrê îro li hire, selameta welatê xwe re dixebite, e›weda(qerebûya) xûna babê xwe ji E›bdilhemîd dixwaze.

Berî bîst sala, Xinkar babê wî, hinek wezîrên dî ve rêkiribî TAYIFê (الطائف), wê derê nefî kiribî, paşê, du-sê mirowên cellad(kujer) dizî ve rêkir wê derê, ew wezîrê hinde xeyûr, şev, nav cih de, dizî ve da xeniqandin!...

Îro, lawê wî wezîrî, «E›lî Heyder Beg», weq›a babê xwe teferru›atê ve neşir û i›lan dike. Da xelq hemî bizanibin ku Xinkar çi mirow e, da Kurd jî waqifê wî halê fecî› bibin, min lizûma tercema wê kitêbê bi cerîda xwe lazim dît. Ezê paş niho heta temam bibe, vê behsê binivîsim, we mine ellahî el tewfîq…

Xelq hemî dizanin ku berî bîst û pênc sala Padşah E›bdile›zîz bî, ew jî çiku gelek musrif û sefîh bî, wezîrên wî itifaq kirin, Şêx el islamê wî zemanî fetwa da, ew Padşah xeli› kirin. Ebdile›zîz hewqas bi text û tacê xwe mexrûr bî, ku tucara halek holê nedihate bîrê. Heta weqta ku hinek mirowên gelek sadiqên wî, gelek hejê dikirin, ew niyeta wezîrên wî jê re e›rdkirin, ew hewqasî ew curet(dilêrî) musteb›ed(dûr) didît ku ewê ew miro tekdîrkirin. Heta Sedir E›zemê wî Mihemed Ruşdî muhra sedaretê i›ade nekir, Ebdile›zîz xeli›a xwe bawer nedikir.

Ebdile›zîz hewqas musrif bî ku zemanê wî de mucewheratên xezîneyê bazara de dihat firotin. Zemanê Ebdile›zîz, xeyrî vê sefahetê ku muxerrib milet bî, hinek wezîrê wî jî wek Mehmûd Nedîm û Mehmûd Celaleddîn hebîn ku wan jî ser minfe›ta xwe pêl millet dikir. Loma, halê milletî gelek tehlukeyê de bî, ji xeli›ê pêve, tu çare selamet nema bî. Lakin heyf, sed heyf ku E›bdile›zîz çû, E›bdilhemîd hat!

Sultan E›bdile›zîz bes xizna dewletê sûisti›mal dikir, lakin ji xeyrî wan ehwal û gelek halên xirab ên dî, exlaqê milletî hewqas ifsad dikir, ku sed-dused sala de islah nabe.

Lakin ev felaketa E›bdilhemîd bûyî Padşah, ji nesaxiya Sultan Murad tewellid kir. Sultan Murad padşahekî gelek a›dil bî, wekî hatî ser textî, mirowên gelek qenc wek Dhiya Paşa (ضيا) wek Kemal Begê anî dor xwe. Lakin mixabinî ku pênc-şeş roja paş cilûsê, halê wî mutexeyir bî, ji weq›a selefê xwe û ji ixişaşa milletî tirsa bû, loma e›qlê wî gelek reht bî, heta tesliyeta Xinkar re Midhet Paşa wî zemanî sê roja pey hev serayê de ma bî.

Xirabiya zihna wî, çar-pênc roja paş cilûsê zêde xuya bî, lakin bi himeta Midhet û Mihemed Ruşdî Paşa ew halê Xinkar xef(veşartî) dima û ji milekî ve jî, .....

8

**Çawa Sultan ... Dûmahîk**

bi tewsiya tebîbek navê wî L.Dêstrov.J û yaneyê her roj Sultan Murad bi rifaqeta Midhet Paşa ser behrê dikira tenezzuh dikir û vî sûretî tedawî dibî.

Sultan Murad ne yekcar dîn bî, lê dehşeta ehwalê tesîr e›saba, xûna wî nijkê ve hicûm mejiyê wî kiribî. Loma, ew tebîb L.Dêstrov digo heger çend hîvekî Xinkar bi tenezzuh tedawî bikin wê yekcar qenc bibe, û heqîqet hal jî ho bî.

Sultan Murad wekî birayê xwe E›bdile›zîz re çûbî Ewropayê, Padşahê Firanseyê Napolyon e›qlê Sultan Murad gelek tehsîn teqdîr kiribî. Ev teweciha Napolyon heseda E›bdile›zîz tehrîk kiribî, û çiku welî e›hid bî, E›bdile›zîz qet hejê nedkir, her bi xişm û xedeb fedkiriyê(lêdinerî), ew cûr û mehabeta ha jî, Sultan Murad aciz kiribî.

Weqta ku bi vî halî Midhet Paşa û Mihemed Ruşdî Paşa tedawiya Padşah dixebitîn, E›bdilhemîd ji halê xeberd ar bî. Paş Murad dora seltenetê ya wî bî, ew jî ser Padşahiyê dîn bî, ewî wê demê dest mifsedetê kir û nikbet û bextreşiya vî milet û dewletê jî wê demê ve destpê kir.

E›bdilhemîd hê kiçik (piçûk) nav serayê de û nav birayên xwe yê dî de, casûsî, mizûrî dikir. Hinga Midhet Paşa, Şehzade Sultan Murad (Gereke E›bdile›zîz be) re tedbîrên xeli›ê didan, ewî his kir û diçû xeber dida Sultan E›bdile›zîz, û ser huriyetrperweriya Midhet û Ruşdî paşa hej wan nedikir.

E›bdilhemîd, paş istixbara nesaxiya birayê xwe, banî Mehmûd û Redîf Paşa kir, ewî dizanî ku ew herdu paşa denî(nizim-دنـيء) û gelek minfe›tperest bîn. Go wan, ku heger arî wî bikin, yanî muweffeq bibin E›bdilhemîd derkeve ser textî, ewê yekî bike Sedir E›zem û yê dî jî bike Mişîrê mabeynê(Navendê). Ewan jî ser minfe›ta xwe, ne fihêt û ne heya ew teklîf qebûl kirin.

**Mabe›id heye**
**(Dûmahîk heye) …**

***Di hejmara 23an de ku Roja Înê 23Şewal sene1317Koçî, beramberî 23ê Sibata 1900Zayî hatiye weşandin, mîrê gewre wiha berdewam kiriye:***

**Weqe›t Midhet Paş**
**Istitrad- mabe›id**
**(استطراد ما بعد)**

Mehmûd û Redîf Paşa zanîn ku ev şixul zû nabe, loma ewlen(pêşî), dîniya Sultan Murad i›lan kirin û paşî i›lan kirin go hikûmet dest Midhet Paşa û Ruşdî Paşa maye. Rojên Înê, Sultan Murad nedikarî derkeve biçe camiyê, kesî ew nedidît. Loma ew îşa›a Mehmûd û Redîf tayîd dikir. Loma, qîl û qal ket nav xelqê de, xelqê dest şikatê kir. Xelqê digo»Heger Xinkarê me nîne, bêjin me. Eger em dest Midhet û Rûşdî paşa mane, bêjin me da em jî bizanibn».

Lakin E›bdilhemîd dît ku evşikayeta xelqê zemanek hindik de temirî, loma murace›t sefîrê Rûsyayê Agnatêv kir. Ewî jî ev hal fursetek qenc dît, loma ji zulma Bulgaristanê behis kir û dest i›lana şerî kir. Agnatêv murace›t suferayên dî jî kir, ji nav wan sefîrê Ingilterê bî, sêr HanryLiyard hal hemî dizanî, loma qet guhê xwe neda Agnatêv. Ewî(Agnatêv) jî dîsa Sultan E›bdilhemîd re istişare kir û bi dersa ji efendiyê xwe standî hereket kir, ye›nî çû Bab el a›alî go min divê ez i›timad-nama xwe bidim Xinkar, ezê ji wî re behsa zulma li Bulgaristanê dibe bêjim, loma min divê ez bibînim!

E›bdilhemîd dizanî ku Sultan Murad hal nebî sefîra qebûl bike, loma ev şîret li Agnatêv kiribî. Bi teşwîqa sefîrê Rûsyayê xeyrî sêr HanryLiyard suferayên dî hemî muttefiq bîn. Midhet û Ruşdî Paşa ji vê hereketa ha gelek heyirî mabîn. Paş çend rojekî, Midhet Paşa rojekê dît ku Mehmûd û Redîf Paşa hatin nik(cem) wî, bi vî terzî e›rdehal kirin:

«we halê xel›ê nîşan me kir, îro sufera hemî dizanin ku Xinkar dîn e. Padşahiya mirowek dîn e›qlen, şere›n ne cayiz e. Heger we navê win arî me bikin, emê bi mu›aweneta sufera E›bdilhemîd iclas bikin». Wan xeberên herdiwa, Midhet Paşa nav dehşetê de hişt, loma hema wê rojê rabî çû nik E›bdilhemîd. Sultan E›bdilhemîd wê hingê çiftelika(مزرعة) xwe ya Moslo yê de bî.

Weqta ku herdu Paşa çûne hidûra wî, mesele, ye›nî nesaxiya Sultan Murad jê re e›rdkirin, Midhet Paşa jê rica kir ku wikaleten derkeve ser textî heta Sultan Murad î›ade a›fiyet bike, Sultan E›bdilhemîd wekîlî qebûl nekir. Jû, midhet Paşa go bila esaleten bibe lakin bi wî şertê ku wekî Sultan Murad qenc bî, textî dîsa ji wî re terk bike û zemanê Selteneta xwe de, Qanûn Esasî qebûl bike, ji raya wukela dernekeve, Dhiya (ضيـاء) û Kemal Begê mişawira bîne li nik xwe.

E›bdilhemîd fikra xwe ifşa nekir, seltenet bi vî şertî qebûl kir û ser teleba Midhet Paşa senedek jî dayê. Eve bi vî suretî xel›a Sultan Murad Xamis û cilûsa E›bdilhemîd hasil bî!

Paş cilûsa E›bdilhemîd, dilnexweşî hemî milet istîla kiribî, wukela hemî jî ji istiqbala milletî meyûs (bêhêvî) mabîn. Paş bey›etê, Kemal Beg û Dhiya Paşa muntezir bîn ku E›bdilhemîd wan bibe nik xwe, sera xwe de bike mişawir, çunke ser vê xebera xwe senede jî dabî Midhet Paşa û jê re sond xwaribî, lakin wekî E›bdilhemîd dît bey›et icrabî û îdî xwe Padşah dizanî, guhê xwe neda tu ehid û peymanên xwe. banî Dhiya Paşa .....

9

**Çawa Sultan ... Dûmahîk**

û Kemal Begê nekir, şûna wan, banî Seîd paşa kir danî ber rikaba xwe.

Ev mu›ameleta E›bdilhemîd, Midhet û Ruşdî Paşa û xelqên dî hemî nav hîretê de hişt, çunke E›bdilhemîd ewel roja cilûsa xwe, isbat kir ku sogindî (sonda) xwe de xayin e. paş çend rojekî, wukela hemî xaniyê Mehmûd Paşa de ictîma› (civîn) kir. E›bdilhemîd wukela hemî ifsad kiribî, loma ewan, muzakereyê de qerar dan ku mişrûtiyet îdare ne ilzam e, hinek islahat kare sufera iskat bike.

Lakin Midhet Paşa wekî dît ku ew wizera hemî ser minfe›ta xwe meşrûtiyetê qebûl nakin, e›nirî (xeyidî) û muzakereyê de isbat kir ku çi te›dîla û tenzîmata çêkin, paş çend rojekî hemî yê nav istibdada E›bdilhemîd zayil bibe, loma go ezê istîfa xwe bidim û ji meclisê derket.

E›bdilhemîd waqif ehwal bî. Weqta ku Midhet Paşa çû nik da istîfa bike, ewî nisxeyên Qanûn Esasî ji Midhet Paşa xwest û bi vê teleba ha, omîd da Midhet Paşa. Lakin, netîcet hal, E›bdilhemîd ji i›syana milletî tirsa, loma Qanûn Esasî i›lan kir. Weqta ku Qanûn Esasî i›lan bî, sufera hemî sekinîn, lakin Agnatêv minfe›ta dewleta xwe û îdara dewleta me re, nefî û i›dama Midhet Paşa teleb kir! çunke dizanî ku Midhet Paşa fesada wî bê semere(meywe) dihêle.

Ibtîdayê selteneta xwe hê hemî wizera nekiribî bin destê xwe de. Saniyen (diwem) ev ehwal û tebeddulat nav milletî de dayim mûcib guftûgo dibî, xelqê hemiya digo E›bdilhemîd bi himeta Agnatêv derket ser textî, E›bdilemîd ev hemî dizanî, dibihîst, loma ji xeleyanek u›mûmî gelek ditirsa. Wekî Qanûn Esasî i›lan bî, millet hemî gelek şad û xerm bî, çiku milletî dizanî ku bi vê qanûnê, xelq hemî ji ruhê xwe, malê xwe emîn dibe.

Hikûmeta Rûsyayê bile›kis (berevajî) ji meşrûtiyeta îdara me gelek mikedder bî çunke dizanî ku heger dewleta me bi meşrûtiyetê îdare bibe emê xwey quwet û meknet bibin, loma bilmecbûriye oltimatomîn(inzar) şedîd el meal da hikûmeta me.

Mutalebatên Rûsyayê Meclisa U›mûmî de tezekur kirin, Midhet Paşa reîsê wê meclisê bî, û bê teref mabî, lakin meclis u›mûmen teklîfên Rûsyayê red kir û i›lan herb bî. E›bdilhemîd i›lan kir ku Midhet Paşa divê şerî bike û E›bdilhemîd dizanî bi xayila (غائلة) şer dikare milletî meşxûl bike û bi vê wesîleyê meclisa u›mumî te›tîl bike.

T›etîla meclis meb›ûsa (مبعوثين) re ewwelen nefya Midhet Paşa lazim bî. Vê nuqtê pêre Mehmûd Redîf û Seîd Paşa jî gelek mu›awenet dikir. Ewan jî ser minfe›eta xwe Midhet Paşa nediviya, loma wesîle nikbet tehrîf dikirin, husûl meqseda xwe re, ewan hîlek tertîb kir, ew jî mesela qayîmeya (قوائم) bî.

***Di hejmara 24an a Rojnameya «Kurdistan» de ku roja Duşembê 6 Cumad elewel sene1318 Koçî, beramberî 27ê Tebax1900Zayî hatiye weşandin, Mîr Ebdurehman Bedirxan dosya kuştina Midhet Paşa berdewam dike, dibêje;***

**Weqe’t Midhet Paşa**
**Istitrad- mabe›id**
**(استطراد ما بعد)**

E›bdilhemîd texsîsata (me›aş) xwe bi qayima (جداول) nedistand, wezîrê diwê Midhet Paşa jî digo heger Padşah xwe i›tibar li qayima nekit, gelek xirab e! loma mai›(مانع) dibî. Dizê Midhet Paşa, nazir maliyeyê Xalib Paşa texsîsata Xinkar bi zêr rêdikr. Midhet Paşa ev bihîst, çû mabeynê(Navendê) cem Xinkar, e›zla Xalib Paşa û î›ada texsîsatê teleb kir. Ev teleba Midhet Paşa is›af nebî, lakin Sedir E›zem çû mala xwe isti›fa xwe teleb kir, heft roja ji mala xwe derneket.

Vî zemanî de, gelek cara Xinkar jê re xeber rêdikr da biçe ser şixulê xwe, lakin Midhet Paşa hemî red kir. Paş du roja Xinkar xeber ji Midhet Paşa re şand ku metlebên wî qebûl kiriye bila biçe mabeynê.

Midhet Paşa bawer kir, çû, lakin dît ku ev davek bî, ji ber weqta ku çû mabeynê ket mezelekê de, yawirek (harisek) çû nik, muhra Sedaretê jê xwest! Wê hingê ewî zanî Xinkar çi hîle lê kir, derêxist, muhir da û paş du se›ta li Waporê (Gemiyê) siwar kirin û ji Istenbolê derêxistin.

Xinkar ji nefya Midhet Paşa gelek ditirsa, loma gelek i›tina dikir. Weqta ku Xinkar dît milet deng nake, gelek dilxweş bî û Midhet Paşa jî rêkir nav Ingilîz. Midhet Paşa li nav Ewropayê jî mezher teqdîr bî, loma her Xinkar jê ditirsa heta heq-sikût jê re ihsan rêkir, lakin ewî nestand, red kir.

E›bdilhemîd ji vê halê yekcar a›ciz dibî. E›bdilhemîd nihayet xwe hew girt, banî Midhet Paşa kir, ewî jî icabet kir, çû Kirêdê (Girava Kirêdê li Yonanê ye) sakin bî. Midhet Paşa wê derê jî xidmet ji wetenê xwe re dikir, xelqên wê derê gelek ji Midhet Paşa memnûn bîn, misilman û file hemî dost û muttefiq bîn.

Paş du heyva, Midhet Paşa telegrafek Xinkar stand ku biye Sedir E›zm, paş du se›tan, dîsa telegrafek stand ku biye Walîyê Şamê. Nihayet, çû Şamê.

***Di hejmara 25an a Rojnameya «Kurdistan» de ku roja Duşembê 6 Cumad elaxir sene1318 Koçî, beramberî 1ê Çiriya Pêşîn 1900Zayî hatiye weşandin, mîrê me, dûmahiya dosyayê bi vî awayî di pêşgotina hejmarê de nivîsandiye:*** .....

10

**Çawa Sultan ... Dûmahîk**

**Weqe›t Midhet Paşa**

**Is̈titrad- mabe›id**

**(استطراد ما بعد)**

Li Şamê jî, Midhet Paşa bi himet û xîreta xwe li xelqê hemiya da hejêkirin, loma Xinkar dîsa ji vê halê reht bî. Loma du cara da jehirkirin, lakin Midhet Paşa herdu cara jî xilas bî. Xinkar îdî nikarî wî li Şamê bihêle, te›yîn Izmîrê kir, paş çend hîvekê, Xinkar Hilmî Paşa û hinek yawir (Haris) rêkir Izmîrê da Midhet Paşa û jin û zaroyên wî bide kuştin!

Nihayet, şevekê se›t şeş, Hilmî Paşa gelek e›sker û yawira re xaniyê Midhet Paşa muhasere(dorpêç) kir, Midhet Paşa derekê pişt xanî re derket çû sefareta Fransayê. Weqta ku Hilmî paşa bihîs̈t ku Midhet Paşa ne li mal e, emir da e›skerî, hemî ketin xanî de nav jin û zaroya. Hilmî Paşa şîr(şûr) kişand ser jina Midhet Paşa, ji şîrê Hilmî Paşa netirsa, ewê bi zimanê xwe Hilmî Paşa tehqîr kir. Hasil, wê şevê ew xanî ji mehşerê (roja Qiyametê) nimûneyek bî. Weqta ku hikûmetê bihîs̈t Midhet Paşa li sefareta (Konsulxane)Fransayê de ye, hikûmetê ji Fransayê rica kir, Xinkar gelek we›dên xweş ji Fransayê re kir da Midhet Paşa teslîm bike. Nihayet, Midhet Paşa hat teslîmkirin!

Midhet Paşa çend rojekî li qijla Izmîrê mewqûf ma, paşê rêkirin li Is̈tanbolê. Wê derê, Xinkar ew bi qetla Sultan E›bdile›zîz itîham kir, mehkeme teşkîl kir, ew mihakeme kir. Her yekî re deh hezar zêr da, du şahidên derewker peyda kir, ewan herdu şahida li mehkemeyê bi temaya perê E›bdilhemîd, derew sogind xwar, bi vî sûretî, mehkema E›bdilhemîd pê casûs û erzalên derewê xwe teşkîl kirî, Midhet Paşa bi i›damê mehkûm kir. Paşê E›bdilhemîd xeber jê re rêkir, go bila bê des̈tê min maç bike ji min e›fû bixwaze, ezê wî e›fû bikim û heta dîsa bikim Sedir E›zem! Lakin Midhet Paşa tenezzul nekir des̈tê xinkareke holê denî (دنــيء) maç bike!!...Lakin Xinkar nedikarî wî li Is̈tenbolê i›dam bike, ji ixtilalê ditirsa, loma nefî Tayifê (الطائـف) kir, wê derê salekê hebis ma.

Wî zemanî de, reîs e›şîretek e›rebî hebî, navê wî Ibin el-reşîd. Ewî ciwanî de Paşa yî dizanî û dos̈tê wî bî, loma rojekê hinek xulamên xwe ve çû qele›ya Midhet Paşa li têde mewqûf muhasere kir, diviya wî xilas bike. Lakin, qele›yê de gelek gelek e›sker hebî, me›iyeta wî kifayet nedikir, lakin weqta ku ewî Midhet Paşa ji pencereyê dît, jê gazî kir da xwe ji pencereyê bavêje da wî xilas bike, lakin Midhet Paşa ji dinê des̈tê xwe şûştibî, loma ev teklîfa Ibin-el reşîd qebûl nekir.

Hereketa Ibin-elreşîd gelek Xinkar tirsand, loma Sefwet Paş ji Walîtiya Hicazê e›zil kir, Osman Paşa rêkir şûna wî û qet›î emir dabî ku zû rojekê Midhet Paşa bide kuştin. Ewî jî paş pêlekê, ew me›sûm (bêguneh) bi emrê Xinkar û bi mirovên E›bdilhemîd ji Is̈tenbolê rêkirî, nav cih de da xeniqandin!

Nihayet, E›bdilhemîd ew mirovê dewletê re hinde xidmet kirî bi wî sûretî, ye›nî bi hinde hîle, da kuştin. Miro muteheyir dimîne çawa Padşahek dikare hinde tenezzul bike!

Xwedê rehmetê li wî Paşayî bike, û Xwedê ceza Xinkarî bide, Xwedê wî zû ji ser vî milk û milletî hilîne, da misilman hemî jê xilas bibin.

---

**Ji Otrixt bo ... Dûmahîk**

xwe biryara xwe bidî, li ser şopa bavê xwe û her 19 ciwanên pê re ketibûn dava felaketê biçî.

Min bihîs̈t ku gelek zilam ji bo peydakirina pêdiviyên jiyanê, digel ku ew rijêmê nefret dikin jî, careke din tevlî bekçiyên sînor(qoloçiyan) bûne, gelo birayê te yê mezin Ozkam jî tevlî wan nebûye?! Bi ras̈tî ez nikarim bawer bikim ku îro temenê wî bûye 22 salî!

Berî çend salan, li ser malperên NETê min gotarek xwend, tu yek ji wan zarokan bû ku te gelek pirs li ser bavê xwe kiribûn, diya te ji rojnamevan re gotibû ku ji nav her 5 zaroyên wê tu yê herî bêtir ji tenahiyê hez dikî, kêm danûs̈tandin î, û her roj tu dicî serdana gorna bavê xwe dikî û her tu li sedemên kuştina wî dipirsî. Piştî 5 rojan ji felaketê, berî 3 mahan ji hevdîtina min bi te û malbata te re, dema ku cara pêşîn ez hatim gund, min jî ji malbatên qurbaniyan ev pirs dikir:»Çima ev çêbû»? Tu dizanî bersiva wan çi bû? «Ji ber ku em Kurd in»!

Weke rojnamevan, min nikarîbû vê bersivê derbas û piştguh bikim, û ji bo ez vê yekê ji xwendevanên xwe re şirove bikim, min li ser vê gotinê lêkolîn çêkir. Piştî lêpirsîn, hevdîtinên ku min pêkanîne û vegera min li jêderên dîrokî digel serdanên min li gund ez gihame encamê:

Bavê te Osman Kablan û 33 kesên din ji ber ku Kurd bûn, ew hatine kuştin. Divê tu zanibî da ku li Turkiyê tu wateya «tu Kurd bî» nas bikî, hê tu di nîvê rê de yî, ji te re têgihiştina vê yekê pir zor e!

Tu ne bi tenê yî xoşewis̈tê min Mehmûd… Malbata te ya dilovan, gundê te, miletê te, tevaya tevgerê bi te re ye, li kêleka te ne! Jibîr meke ku ezê jî herdem li kêleka te bim.

Ta ez sax bim, Roboskî jibîr nakim!

Ta careke din em hev bibînin, hay ji xwe hebe!

***Frîdrîka***

***Otrêxt 23ê Çilleya Pêşîn 2021Z***

**Ji Otrixt bo ... Dûmahîk**

meydanî ji cûrekî nû, ku ew derdora salekê di nav şervanên Partiya Karkerên Kurdistanê, li asêgeh û çiyan geriya ye, li sala 2018an, pirtûka xwe bi zimanê Holendî weşandiye, û li destpêka sala 2021an bi zimanê Ingilîzî û navnîşana»This fire never dies» (Tu carî ev agir venamire) weşndiye.

Kuştara Roboskî, guhertineke mezin di jiyana rojnamevanî ya nivîskara Holendî de pêk aniye. Ewê bawerî bi raporan neaniye, bi xwe devera Roboskî nas kiriye û li malên qurbaniyan di wî bajarokê piçûk de geriya ye, kes û nişteciyên wî yên di xemgîniyê de noqbûyî nas kirine û hevaltî bi wan re saz kiriye. Frîdrîka, dostanî bi malbata qurbanî Osman Kablan re çêkiriye, endamên wê yek bi yek ji nêzîk ve nas kirine, demeke dirêj bi wan û malbatên qurbanîne din re derbas kiriye.

Mehmûd, kurê piçûk ê Kablan e, wê dema ku Frîdrîka wî li ber deriyê malê dîtibû, xwe bi guliyê darekê ve daleqandibû, temenê wî 5 salî bû, nizanîbû çi li derdora wî bûye.

Di 10mîn salvegera Kuştara Roboskî de bi rêya»Navenda Kurdî ya Xwendinan» Frîdrîka Xêrdînk, ev nameya jêrîn ji Mehmûd Kalban re şandiye:

**Xoşewistê min Mehmûd...**

Dema cara pêşîn min tu dîtî, temenê te 5 salî bû. Nizanim te xwest me bi rastiya temenê xwe bixapîne yan jî bi rastî te temenê xwe nas nedikir, te ji me re got temenê te 6 salî ye, lê herdu xwişkên te yên ji te mestir Sînem û Israa, bi qerf û henek temenê te yê rastî tekez kirin û kenê xwe bi xapandina te ya piçûk kirin.

Baş tê bîra min, hevalekî mîna te bêcir û netebitî bi te re bû, navê wî nayê bîra min. tu hildikişî ser wî deriyê şîn ê şikestî yê mezela rûniştinê û te derî digirt û vedikir, xwe diherikand. Dema diya te xwest ku tu herî derve bilîzî, bi lez te bazda, xwe çem kir û şaxê darekê li ber malê girt, xwe pêve daleqand, ber jor û jêr ve xwe dihejand. Min gazî te kir got»Abcî» ku wateya wê bi zimanê Holendî»Meymûnê piçûk»e. Te awireke tûj ji min veda û gote min, wê gotinê rast bilêv bike»Apoçî». Tê bîra te?

Wê hingê, te nizanîbû bê berî sê mehan, 28ê Çilleya Pêşîn a 2011an çi çêbûye?! Di jiyana te û malbata te de, ew roj, rojeke pir bi dax û xemgîn bû. Di wê rojê de, bavê te bar kir û ew nema li jianê ye. Ew digel 33 kesên din ji bazirganên sînor, dema vegerê û derbaskirina sînorê Turkiyê, ew toşî gulebaranekê ji artêşa Turkiyê bûne, hemû hatine kuştin!... Kî dikare van pirsan ji te re şirove bike? Tê bîra min, diya te Pakîze ji min re got, wê û endamên malbatê nexwestin vê bobelatê ji zarokan re şirove bikin. Vêca, ji we zarokan tê xwestin ku hun zarok bi xwe tayê vê çîrokê bigrin û bişopînin, digel naskirin û têgihiştina bûyerê di rêya raporên ragihandinê de, hêdî-hêdî rastiya wê nas bikin.

Piştî derbasbûna çend salan di ser vê felaketê re, tu fêrî bûyerê bûyî. Dema cara pêşîn min serdana malbata te kir, wê demê, temenê xwişka te Hûlya 7 salî bû, wê diyar kir ku wê çîrokek wiha berî du-sê salan xwendiye. Lê, piştî çend salan ji felaketê, ji nû ve wê rastiya bûyera bavê xwe nas kiriye. Wê ji xwe dipirsî, gelo di wê dema ku hikûmet guh nade vê bûyerê, çawa ewê hûrguliyên wê nas bike!? Vêga ew 19 salî ye, gelo ew dizane ku rastiya bûyerê bi çi rengî bû û haya hikûmetê jê hebû lê wê di ser guhên xwe re davêt?

**Xoşewistê min Mehmûd...**

Tevî ku tu pçûk bûyî, bazdida û dileyistî û li ser guliyê daran hêlan dikir, carina kêlîkine bêdengiyê bi te re derbas dibûn. Di wê dema ku te, yan kesekî din mîna diya te, pîrka te di helkeftinekê de wêneyeke mizin a bavê te Osman Kablan hildida, hingî wê bêdengiyê destpê dikir. Li hemberî vê dîdara xembar, laşê te hemû dilerize, çavên te çîrokeke xemgîn û kûr dibêjin, ruwê te zer dibe û gotinê te di singa te de asê dimînin, bi kul û xemên giran tu serê xwe diçimînî. Dema ew dîdara xembar tê bîra min, ji êşê, dilê min dişewite, dike parçe parçe bibe.

Piştî ku li Êlûna sala 2015an ez ji Turkiyê hatim bidûrxistin, ez nema pir bi malbata te re peyivîm. Tê bîra te berî çend salan bi telephonê em bi hev re peyivîn? Te ji min pirsî kengî careke din ezê bême cem we? Eger bi destê min bûya, yekser ezê vegeriyama, lê mixabin, hikûmet rê nade careke din ez vegerim. Tu dizanî, piştî ku polîsê Turkiyê li Yoksîkova ez serbest berdam, roja din, min kar û barê xwe bo serdana we dikir. Cejna Qurbanê nêzîk bû û piştî du salan ji proseya aştiyê, Ardogan prose rawestand û dest bi şer kir. Min xwest ez icaza xwe bi malbata te û gundiyên din re biborînim. Û min ji xwe pirsî gelo piştî têkçûna proseya aştiyê dê çi bi serê Roboskî were! û bandora şer li jiyana rojane ya xelkê, ji bilî metirsiyên li ser wan malbatên ku daxwaza lêkolîn û dadmendiyê di felaketa Roboskî de kirine! Ji roja 28ê Çilleya 2011an ve, tevgera çûn û hatina qeçaxçiyan di wê xala sînorî de rawestiya ye. Ez dipirsim gelo tevî ku tu dizanî çi bi bavê te û hevalên wî re çêbûye, tê li ser rêbaza wî biçî? Ji ber ku temenê te 15 salî ye, bêgoman tê bi ..... 

10

# Ji Otrixt bo Roboskî

## (Ta ez sax bim, Roboskî ji bîr nakim!)


**Frîdrîka Xêrdînk**

*Werger ji Zimanê Erebî bo Kurdî:*
**Desteya NEWROZ**

Mîna vê rojê 28ê Berçilleya sala 2011an, di wê dema ku artêşa Turkiyê kuştareke hovane li dijî kerwanekî Kurdên belengaz ên ku ji bo debar û abora xwe ya rojane, kel û pelên xwarinê diguhestin herdu aliyên sînor di navbera Turkiyê û Îraqê de bikar anîbû, rojnamevana Holendî xanim Frîdrîka Xêrdînk li Istanbolê bû.

Li gora belgeyên lêkolînê, haya dewleta Turkiyê ji wê yekê hebû ku ji bo peydakirina pêdiviyên jiyana rojane, xelkê deverê karê qaçaxiyê dikin, wê jî çav digirt çimku dixwest xelkên deverê tenê bi peydakirina nanê rojê mijûl bin û dûrî tevgera Siyasî û ya çekdarî bin. Lê, ji ber sedemine nediyar, destelata Turkiyê biryara gulebarankirina komekê ji wan kesên ku li hêla bajarê Roboskî/ Parêzgeha Şernexê sînor derbas dikin da. Hat gotin ku balefireke Emerîkî ya bê ajovan agahiya wê komê daye Turkiyê û di encam de, endamên wê komê bi tevayî hatine kuştin ku hemû gundiyên perîşan û belengaz bûn, 19 kes ji wan zarok bûn, temenê wan ji 18 salan kêmtir bû!

Piştî derbasbûna çend rojan di ser vê kuştara bi êş û jan re, eva ku ragihandina fermî ya dewleta Turkiyê hewl dida ku wê mîna bûyereke gomankirî û qurbaniyên wê kesine li derveyî zagonê ne ji raya giştî re nîşan bide. Lê, piştî ku hûrguliyên kuştarê aşkere bûn, ragihandina Turkiyê got qaşo şaşîtî di navbera qaçaxçî û kesên li derveyî zagonê ne çêbûye û ew derew dabû ber ruwê xwe, birêz Frîdrîka biryara xwe da ku ew lêkolîneke berfireh li ser vê kuştarê amade bike. Di encama lêpirsîn û lêkolîna xwe de, Frîdrîka bi navnîşana «Zarok mirin» pirtûkek




weşand, têde dîroka doza Kurdî li Turkiyê tîne zimên. Ji pirsa kuştara Roboskî destpê kiriye û gihaye vê pirsa jêrîn:

Gelo bi rastî, ji ber ku ev kes Kurd bûn ew hatine kuştin?!

Paşê, ev pirs, berê nivîskara me dide pêkanîna lêkolîneke ..... 11

# Zeyneb Hiso Keça Kurd a Efrînî Bawernameya Doktorayê wergirt



Keça Kurd a Efrînî ya zîrek, Zeyneb Hiso/Efrîn-Gundê Qitmê, ji zanîngeha Helebê, di beşê Aboriya Çandinî de, bi pileya herî qenc(nuwaze) 90.6% bawernameya Doktorayê bidestxist.

Serperiştiyên nameya Dr. Zeyneb ev bûn:

Prof. Dr. Mahir Yûsif.

Dr. Nîroz Ferdawî.

Komîteya Navbijiyê(Tehkîmê):

1. Prof. Dr. Ebdulxenî Ebdulletîf. Serok
2. Prof. Dr. Mahir Yûsif... Endam
3. Prof. Dr. Mihemed Dahir... Endam
4. Dr. Bişar Nene... Endam
5. Dr. Mustefa Himêdî. Endam

Gelê Kurd bi gelemperî û Efrîna dagirkirî bi taybetî bi keç û lawên xwe yên serkeftî şanaz û bextiyar e!

Ev serkeftin li Dr. Zeyneb û malbata wê pîroz be.

**Jêder/Facebook: Rûpela Afrin City**

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**